

NIRXANDINA SÊ BERHEMÊN ZIMANÎ YÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ JI ALÎYÊ ZIMANÎ VE

Dr. Mikail Bûlbûl

Weqfa Mezopotamyayê- Dîyarbekir /Turkiye

Doç. Dr. Mustafa Öztürk

Zanîngeha Mardin Artukluyê- Enstîtuya Zimanên Zindî/ Tirkîye

Puxte:

Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1867) di salên 1860an da, ji bo hînkirina kurdîya kurmancî gelek berhem nivîsîne. Bazîdî mamostayê kurdî yê Aleksandre Jabayî (1801-1894) bû ku Jaba balyozê Rûsyayê bû û 15 salan li Erziromê mabû. Jabayî gelek berhemên ku ji bo meydana kurdnasîyê pir giring û dîrokî ne, kom kirine û qeyd kirine. Bi dehan berhemên giranbiha yên li ser dîrok, edebîyat, folklor, ziman, wergêrnasîyê di Koleksiyona Destxetan ya Aleksandre Jabayî cih digirin. Sê berhemên gelekî nirxdar jî li ser ziman û rêzimana kurdî tê da hene ku Mela Mehmûdê Bazîdî ji bo ku kurdî hînê Aleksandre Jabayî bike nivîsîne. Ev berhem “Tuhfetul Xîlan fî Zîmanê Kurdan”, “Kêşana Karên Kurdî” (1866) û “Xeberdana Zîmanê Kurmancî ye” (1865) ne. Du berhemên pêşî li ser rêzimana kurdîya kurmancî ne û ya dawî jî ji dîyalogan pêk tê û Bazîdî xwastîye bi rêya dîyalogan ziman hîn bike.

Di vê vekolîna xwe da, em dê ji alîyê zimanî ve nirxandina van sê berheman bikin. Bazîdî di berhemên rêzimanî da kurdî li gor tîpolojîya erebî analîz kirîye û loma jî gelek termên rêzimanî bi erebî ne. Bi taybetî berhema wî ya “Tuhfetul Xîlan fî Zîmanê Kurdan” rêzimaneka gelekî bi kitekit e û dehan mijarên rêzimanî bi xwe da dihevwîne. Berhema wî ya din ya rêzimanî jî, tematîk e û li ser kêşana karên kurdî ye. Beşek ji vê xebata wî jî ferhengokek e ku xuya ye yekem ferhenga kurdî-tirkî ye. Lê berhema wî ya ku heta niha nedihat zanîn “Xeberdana Zîmanê Kurmancî ye” ji alîyê taybetmendiyên zimanî ve ji yên din cudatir e. Bazîdî di seranserê destxeta xwe da, zîmanê rojane anku zîmanê nav xelkî bi kar anîye. Gelek mijarên ji hev cuda tê da hene û ji alîyê ferhengê ve gelekî dewlemend e. Ji pevçûnên nav dewlet, eşîr û malbatan bigirin heta baweriyên nav xelkî, ji karûbarên bazîrganî bigirin heta nexweşî û tedawîkirina wan, bi dehan mijar, bi zîmanê rojane lê ferhengeka zengîn pêşkêş kirîye.

Peyvên Serekî: *Mela Mehmûdê Bazîdî, Zîman, Rêzîman, Termînolojî, Ferheng.*

Pêşekî:

Koleksiyona Aleksandre Jabayî ya Destnivîsên Kurdî ji yek arşîvên herî giranbiha ye ji bo dîrok û edebîyata kurdan ku kêmanmendên wê hene. Di vê koleksiyonê da berhemên curbicur yên qadên wekî edebîyat, çand, dîrok, wergêrnasî, zimannasî û hwd tev tê da hene. Yan jî mînakêka din tune ye ku berhevkarê koleksiyonê ji bo bîdestxistina van destnivîsan xebatên meydanî yên pêwîst bi xwe bike û li gel pispor û zanyarên kurd bixebite. Giringî û feydeyeka din ya vê koleksiyona navborî ew e ku di kêmdarferetîya dema xwe da, ev destnivîsên ku ji bo gelek qadên kurdnasîyê heyatî ne, bêtî ku wînda bibin gihîştine ber destê me.

Mela Mehmûdê Bazîdî bi berhemên xwe yê giring ji kesên herî giranbiha yê rewşenbîrîya kurdî ye. Wî bi xebatên xwe yê li ser dîrok, ziman û folklorê kurdan xizmetekê mezin kirîye. Herçend li ser dîroka çêbûna wî tiştekî teqez tune be jî li gor gelek kesan di 1797an da li Bazîdê çê bûye (Öztürk: 2017a:17,19). Ji bo wefata wî jî dîsa dîrok ne teqez be jî wekî 1867 xuya dike (Öztürk: 2017b:62).

Em dê di vekolana xwe da li ser van her sê berhemên dîrokî rawestî û wan ji alîyê taybetmendîyên zimanî ve binirxînin. Ev sê berhem: “Xeberdana Zimanê Kurmacî ye”, “Tuhfetul Xîlan fî Zimanê Kurdan” û “Kêşana Karên Kurdî” ne. Ev berhemên ku em dê li ser wan bixebitin ji alîyê Weşanên Weqfa Mezopotamyayê ve, digel tîpguhêzî, analîz û metnên wan ên resen (faksîmîle) hatine çapkirin. Ji vana “Tuhfetul Xîlan fî Zimanê Kurdan” di sala 2019ê da; “Kêşana Karên Kurdî” di 2020ê da û “Xeberdana Zimanê Kurmacî ye” di 2022ê hatine çapkirin.

Em dê bi berhema “Xeberdana Zimanê Kurmacî ye” dest pê bikin û van berhema ji alîyê taybetmendîyên zimanî û li gor binbeşên wekî, term û termînolojîya rêzimanî, peyvên kêmnas, peyvên ku di ferhengên da cih negirtine, peyvên tirkî, navên meslekên wê demê, navên pîvanan û hwd bînin analîzkirin.

1. BERHEMA “XEBERDANA ZIMANÊ KURMACÎ YE”

Ev berhema Mela Mehmûdê Bazîdî hem ji alîyê taybetmendîyên zimanî ve hem jî ji alîyê naveroka xwe ve gelekî giring e. Mirov ji wan dîyalogan dikare gelek agahîyan bi dest bixe. Taybetmendîyên zimanî û ferhenga ku bi kar anîyê têra xwe zengîn e. Ji alîyê naverokê ve jî gelekî têr û tijî ye ku li ser bûyerên tarîxî, bawerîyên nava xelkî, folklorê kurdan û jîyana rojane agahîyên balkêş û giring tê da hene. Pêşî em li ser taybetmendîyên zimanî bisekinin û paşê jî li ser jîyana rojane û civakî.

Bazîdî di seranserê destnivîsa xwe da zimanê rojane anku zimanê nava xelkî bi kar anîye. Gelek mijarên ji hev cuda tê da hene û ji alîyê ferhengê ve gelekî dewlemend e. Ji peyçûnên nava dewlet, eşîr û malbatan bigirin heta bawerîyên nava xelkî, ji karûbarên bazirganî bigirin heta nexweşî û tedawîkirina wan, bi dehan mijar, bi zimanê rojane lê ferhengeka zengîn pêşkêş kirîye.

Dema em ji alîyê devokî ve li zimanê Bazîdî binêrin, em dibînin ku tesîra devoka Hekarîyê li ser wî xurt e. Mesela yek ji taybetmendîyên devoka hekarîyê bikaranîna paşgira “-itin”ê ye di kêşana karan da, ji bo kesê sêyem û yekhejmar:

“Ji du sed û pêncîyî kêmtir **naditin**.” [wr. 3b]

“Bilanê Haco **biçitin**, ew zîrek e.” [wr. 16b]

“Belê, ‘erd ajar **didetin** pez **dixwitin**, hîle digirî.’” [wr. 24a]

Dîsa yek ji taybetmendîyên devoka hekarî û behdînî ew e ku ji bo paşgira pirhejmar ya îzafeyê, bikaranîna “-êd”ê ye. Em dibînin ku hemû paşgirên îzafeyê di berhemê da “-êd” in. Eger em mînakên bidin:

“Kur û keçê**d** te mezin in?” [wr. 2b]

“Cilê**d** me bişon, em rêwî ne.” [wr. 14a]

“Kurê**d** xwe jî sunet kirine?” [wr. 21a]

Di dîyalogên Bazîdî da tiştekî din ê ji alîyê zimanî ve bala mirovî dikişîne ketina hin pêşdaçekan e. Di devoka serhedê da em dizanin ku gelek caran pêşdaçek dikevin. Bi taybetî em rastî ketina daçeka “bi”yê tînin:

“Min qodek înaye panzdeh qirûşan.” [wr. 8a]

(Min qodek înaye bi panzdeh qirûşan.)

“Te xo qer tu nîne?” [wr. 11a]
(Te bi xo qer tu nîne?)

1.1. Bikaranîna Peyvên Lêkdayî

Dema mirov li destnivîsê dinêre bikaranîna bêjeyên lêkdayî bala mirovî dikişîne. Beşeka zêde ji bêjeyên lêkdayî wekî hevalnav hatine bikaranîn. Yek ji tiştên giring jî giringîya wan ya ji bo ferhengnasîya kurdî ye. Lewra hinek ji wan di ferhengan da nînin. Mesela dema qala hespan dike, wekî taybetmendiyên hespan bêjeyên “kêmeş”, çûnxweş û “kêmavêj”ê bi kar tîne:

- Kêmeş, Çûnxweş, Kêmavêj

“Sûal: Dişibe eva hespa, kêmeş e.

Cewab: Ne, meşa ye û çûnxweş e.

Sûal: Bi texmîn, ev hespa kêmavêj e.” [wr. 3a]

Eger em hinek nimûneyên din ji berhema Bazîdî bidin:

- **Pişthesp:** Xuya ye pişthesp ji bo dîyarkirina temenê kurî bi kar anîye. Yanî dixwaze bibêje ku bi qasî ku li hespê siwar bibe temenî wî heye.

- Sûal: Kur û keçêd te mezin in?

Cewab: Erê, kur pişthesp ne, keç zaro ye.” [wr. 2b]

- **Kêmbiha:** Ji bo “erzan”ê bi kar anîye.

“Sûal: Dexil çi biha ye?

Cewab: Dexil zaf e, kêmbiha ye.” [wr. 29b]

- Zindecahnî

“Zindecahnîya min qe bi xwe ve nayê. [wr. 36a]

- Bihnteng/bihnfirêh

“Sûal: Rastî tu mirofêkî bihteng î.”

Cewab: Ne, ji min bihnfirêhtir mirof nabe.” [wr. 3b]

- Qencmîrof

“Ne walleh, ez qencmîrof im.” [wr. 12a]

- Rûreş, Axîrzan

“Xudê rehma xwe bike, em rûreş in.”

“Xudê nîşî me nede, evne ‘elametê axîrzanê ne.” [wr. 24b]

1.2. Guherîna Dengan û Varyantên Peyvan

Alîyekî din ê zimanî ku bal mirovî dikişîne bikaranîna varyantên peyvan e. Peyvên ku reha wan yek in lê guherînen fonolojîk di wan da çê dibin varyant in. Yanî mana û etîmona wan yek e lê hinek cudahiyên fonolojîk di wan da çê bûne. Wekî nimûne ji dêvla “çêre” peyva “çire” ji dêvla “mîrov peyva” “mîrof” bi kar anîye. Hinek varyant jî hene ji bo heman manayê çê bikin xwedî cudahiyên biçûk yên morfolojîk in. Wekî nimûne ji devla “der ketin”ê bikaranîna forma “bi der ketin”ê. Hebûn û tesbîtîkirina peyvên ku varyantên hev in ji bo xebatên zimanî giring e. Eger hinek nimûneyan bidin:

Çire (ji bo “çêre”yê)

“Ne, çire kê mîrê rizk zelîqetê dikêşe.” [wr. 13a]

Mîrof

“Rast e, du mîrof xeniqîne.” [wr. 34a]

Vê ra (ji dêvla “pê ra”)

“Ne walleh, vê ra negiham.” [wr. 11a]

Bi der ketin (ji dêvla “derketin”ê)

“Em bi xwe bi der ketine serê girekî bilind.” [wr. 17b]

Cab (ji bo “cewab”ê)

“Îroke cab hatiye ku leşkerê rûsan vegerîyaye.” [wr. 17b]

Semol (ji bo “Stenbolê”)

“Şewatekê mezin Semolê bûye.” [wr. 15b]

Kîjk (ji bo “kîjan”ê)

“Ji her du ordîyan kîşk pêkhatî ye?” [wr. 16a]

Bi xeyr (ji bo “ji xeynî, ji bilî”yê)

“Min bi xeyr ji damarekê kes tune.” [wr. 20a]

Kelaştin (ji bo “qelaştin”ê)

“Îşeve paga rispî kelaştine û sê dewarê wî dizîne.” [wr. 25a]

Vebirîn (ji dêvla “birîn”ê)

“Xeber dane, qelenê keçê li sed mîh û deh xelatan vebirîne.” [wr. 23b]

Şika (ji dêvla “şikayet”ê)

“Biçin şika li axayêd wan bikin.” [wr. 25b]

1.3. Bikaranîna Îdyoman û Gotinên Qalibî

Dema em bala xwe didin destnivîsê, em dibînin ku gelek îdyom, qalibên zimanî û mecaz hatine bikaranîn. Piraînya van bikaranînan hîn jî îro gelekî çalak û berbelav in û tên bikaranîn. Eger em hinek nimûneyan bidin dê baştir bê famkirin:

- **Xeber borîn.** (Ji bo “serhişkî”yê ye)

“Ne, axayêd wan xeber nabore.” [wr. 25b]

- **Xurtî li yekî/hinan kirin.**

Gelo kîjanî xurtî li kîjanî kirîye? [wr. 9a]

- **Bexşî yekî/hinan.** (yanî da xatirê yekî/hinan)

“Sûcê wî gelek e, belê min bexşî te.” [wr. 12a]

- **Xudê pê girtin.** (yanî “Xwedê lê me dixê”)

“Walleh em zalim in, Xudê me pê digire.” [wr. 24b]

- **Bi rêkêban çûn.** (yanî pir bi ecele ajotina hespan)

“Eve Silo bi rikêban çûye mala şêx.” [wr. 32a]

- **Xûn bi xûnê naşon, xûn bi avê dişon.**

“Babo, xûnê bi xûnê naşon, xûnê bi avê dişon.” [wr. 33a]

- **Çûna cihê xwe** (Ji bo kirina têkilîya cinsî)

“Cewab: Belê, neçûye cihê xwe. Dibêjin girêdayî ye.

1.4. Bikaranîna Bêjeyên Tirkî

Li ser zimanê Bazîdî karîgerîyeka aşkera ya zimanê tirkî heye. Ev karîgerî ne di asta ristesazîyê da ye lê di asta ferhengî da ye û em rastî gelek peyvên tirkî tên. Helbet têkilîya zimanan û deynkirina peyvên tiştêkî pir normal e lê ji bo me tiştê balkêş ew bû ku gelek peyvên ku kurdîya wan pir aktîf tê bikaranîn û zindî ne lê Bazîdî li şûna wan peyvên tirkî bikaranîye. Mesela ji “ax”ê ra gotîye “toprak”, ji “dawî”yê ra gotîye “son/g” û hwd. Eger nimûneyan ji metna wî bidin.

Toprax (ji “toprak”a tirkî, <https://www.nisanyansozluk.com/kelime/toprak>)

“Bi esil topraxa Îranê ye û panzdeh gund in.” [wr. 6a]

Son/Song (ji “son/song” a tirkî, yanî dawî)

“Belê, wiha song kirîye.”

“Meger songê bi xêr bibe.” [wr. 12b]

Başibozix (ji “başibozuk” a tirkî, yanî bêpergal, bêmîzam)

“Panzdeh hezar peyayê nizamî û êdî siwarî û başibozix e.” [wr. 16a]

Oba (Ji “oba” ya tirkî ku eslê wê mogolî ye. <https://www.nisanyansozluk.com/kelime/oba>)

“Li oba Miho beytarekî çê heye.” [wr. 35b]

Qapû (ji forma kevn ya “kapu” ya tirkî yanî derî. www.nisanyansozluk.com/kelime/kapu)

“Em dê sube çend gundî, herine qapûya mûrov.” [wr. 25b]

Begen kirin (ji “beğenmek” a tirkî, yanî ecibandin. www.nisanyansozluk.com/kelime/beğenmek)

“Ez vî hespî begen nakim.” [wr. 3a]

Bêtik (ji “betik” a tirkî, di manaya tiştên nivîskî, name, kitab û hwd. <https://sozluk.gov.tr/>. Bazîdî ji bo “nivişt”ê bi kar anîye).

“Sûal: Qe derman û nivîşt kirin?

Cewab: Erê walleh. Di “îlac û bêtikan qisûr nema.” [wr. 22a]

Orte (ji “orta” ya tirkî, <https://www.nisanyansozluk.com/kelime/orta>)

“Ne, orte bitin. Ne mezin, ne biçûk.” [wr. 27a]

Toypayî: Ji “toy payî” ya tirkî, di manaya “zîyafet, zîyafeta dawetan” da ye. Bazîdî ji bo xelatên dawetan bi kar anîye.

“Aya em çi bibin toypayê?”

“Sûal: Wisan e, zaf toypayî têtin?

Cewab: Erê, du berayîka mesrefê têtin.” [wr. 21b]

1.5. Bikaranîna Peyvên Kêmnas

Di destxeta Bazîdî da gelek peyv hene ku ji bo me, ne nas in. Beşek ji van peyvên di ferhengên kurdî da jî nînin. Mirov dikare ji kontekstê manaya wan texmîn bike. Mesela dema behsa hespan dike, ji bo hespan taybetmendiyên wan peyvên wekî “meşa”, kêmmes, çûnxweş, kêmavêj” bi kar tîne.

“Sûal: Dişibe eva hespa, kêmmes e.

Cewab: Ne, meşa ye û çûnxweş e.

Sûal: Bi texmîn ev hespa kêmavêj e.” [wr. 3a]

Em ji konteksta jorîn fam dikin ku “meşa” ew hesp e ku ji bo meşê xurt e û dikare mesafeyên dûr û dirêj bimeşe. Peyva “kêmmes”ê jî di manaya “kêmmes”ê ye anku hespê ku nikare zêde bimeşe û bi kêrî rêyên dirêj nayê. Peyva “çûnxweş”ê jî nêzmanaya “meşa”yê ye anku hespê ku rêveçûna wî xweş e û zû naweste. “Kêmavêj” jî xuya ye wekî “kêmmes”ê ye anku ji bo hespê ku bi kêrî rêyên dirêj nayê, hatîye bikaranîn.

Eger em li metna Bazîdî binêrin em gelek peyvên weha kêmnas dikarin bibînin. Em dikarin bi nîmûneyên din dewam bikin:

Pişthesp: Ev peyv ji bo dîyarkirina temenî hatîye bikaranîn. Yanî dixwaze bibêje ku bi qasî ku li hespê siwar bibe temenî wî heye.

“Sûal: Kur û keçêd te mezin in?

Cewab: Erê, kur pişthesp ne, keç zaro ye.” [wr. 2b]

Zimhêr: Tê manaya “zaxîre, erzaqê ji bo zivistanê” (Farqînî: 2022:2623)

“We zimhêr û tedarika malê kirîye?” [wr. 9b]

Pelate: Di hin ferhengan da bi manaya “belav, belawela” (Demirhan:2007:286; Farqînî:1072) hebe jî ev bikaranîna Bazîdî li van manayan nayê. Tiştê ku mirov ji kontekstê fam dike “berhevkirin” e, lê ne “belavkirin” e.

“Sûal: Axa li mal e yanî bi derkê ve çûye?”

Cewab: Dibên ku çûye nava êlê.

Sûal: Ji boy çî çûye nêva êlê?

Cewab: Ji boy pelata xercê çûye.

Sûal: Xercê êla we, serê malê çend e?

Cewab: Mala dewletîyan deh zêr û ê jêrî pênc û sê û du ne. [wr. 5b, 6a]

Kewşen: Manayên “kewşen”ê yên ji hev cuda hene: erazî, sewadeyên derdora gundî, derdor, sînor (Farqînî:1230). Weha xuya ye di manaya “zewîyên derdora gundî” da bi kar anîye.

“Sûal: Dibêjin ku zîpikê li kewşenê me daye?”

Cewab: Erê, ekîn berteref kirîye.” [wr. 12b]

Nijde: Di ferhengan da çend manayên wê hene, lê li vir di manaya “çete”yê da ye. Em li kontekstê binêrin, dîyar dibe. Hem di ferhenga Kurdoî (1960:574) hem jî ya Farqînî da manaya “çete”yê jî heye (r. 1606)

“Sûal: Dibên ku çete li ser rê heye?”

Cewab: Em jî bi himmet dê biçin.

Sûal: Berî niha nijde li vê rê hebû?

Cewab: Xudê giravî berteref bûne. [wr. 14a]

Berîde: Jabayî ji bo vê bêjeyê jî “pillage” û “razzia” gotîye yanî “talan” û “biserdagirtin”. Di ferhenga Kurdoî da jî ev peyv heye (r. 81) “Sûal: Siwarê kurmancan bi xeyr ji terhoîye bi kêrî tiştêkî nayê.

Cewab: Belê wisan e, ji boy berîdê qenc in.” [wr.18b]

Berayîk: Di ferhenga Farqînîyî da “berayîk” di manaya “pêşeng”ê da (r. 153), di ferhenga Îzolîyî da “berayî” di manayên “firehî” û “destpêk”ê da heye (r. 66). Lê ev mana dûrî vê kontekstê ne û lê nayên. Manaya herî nêzik di ferhenga Kurdoî da heye ku wî jî gotîye “cot”. (r. 229). Lê di ferhenga Kurdoî da ne “berayîk” lê “dûberayîk” e. Dema em li destnivîsa Bazîdî û kontekstê dinêrin “berayîk” bi manaya “beranber”ê tê. “Du berayîk” yanî dibe “du qat”, “du car beranber”. Ji ber ku di kontekstê da dipirse ku “toypayî anku hedîye pir tên ji bo dawetê”, dibêje “erê du qatê mesrefa dawetê hedîye tên”.

“Sûal: Gelo gelek mirof gazî kirîye?”

Cewab: Belê, ji sed mirovan pitir gazî kirîye.

Sûal: Wisan e, zaf toypayî têtin?

Cewab: Erê, du berayîka mesrefê têtin.” [wr. 21b]

Qirên: Tê manaya “şer, pevçûn”ê (Îzolî:591). “Qirên kirin” jî kara wê ye û dibe “şer kirin, pev çûn”.

“Sûal: Go ku axê digel rispî qirên kirine?”

Cewab: Belê, êkidû caris kirine.

Sûal: Li ser çî qirêna wan bûye?

Cewab: Li ser beşîya peran e.” [wr. 31a]

Vesû hatin: “Vesû hatin” tê manaya “xeyidîn” û “aciz bûn”ê. (Farqînî:2406) “Bi rastî ez ji te vesû hatime.” [wr. 29a]

Perseng: Tê manayên wekî “giranî, mêzên, pîvan û denge”yê. (Bedir khan, Bertolino, Nezan, 2017:1173; Farqînî:1658)

“Ne, perseng heye, ser diditin.

Wisan guneh e, kê m zêde diçe.” [wr. 44a]

Maye: Ji bo “sermaye”yê bi kar anîye.

Te maye û diraf heye? [wr. 42b]

Korbêder: Bêder bender e, korbêder jî bendera ku nebaş e û tişt jê nehatîye.

“Bêderêd we ketine?

Belê, korbêder e.” [wr. 13a]

Zamin: Ji bo “kefil” bi kar anîye.

“Ez zamin, eger kesek dozê bikitin.” [wr. 20a]

Wekîlnefs: Kesê ku dikare xwe û nefsa xwe kontrol bike.

“Qîz ‘aql e, balix e, wekîlnefs e.” [wr. 20a]

Bankut: Ji bo “mizgînî”yê bi kar anîye.

“Em de’wa bankutê dikin.” [wr. 22b]

Kelûmel: Ji bo “kelûpel”ê bi kar anîye.

“Ez texmîn dikim ku du bargîr têra kelûmelê me nake.” [wr. 8b]

Terho: Talan (Jabayî ji bo vê bêjeyê “pillager/çapul” bi kar anîye)

“Siwarê kurmancan bi xeyr ji terho yê bi kêrî tişteki nayê. [wr.18b]

Şerqeda: Ji bo “xerab”ê bi kar anîye. Di ferhenga Kurdo yî da forma

“şerqede” heye. (r. 702)

“Sûal: Ez nizamim çi bibêjim, tu mirofêki şerqeda yî.

Cewab: Ne walleh, ez qencmîrof im.” [wr. 12a]

Mûrov: Wezîfedarê hikûmetê ye ku karê polîsîyê dike.

(<https://turklehceleri.org/tr/hepsi/anlam/murov>)

“Sûal: Wisan e, biçin şika li mûrov bikin.

Cewab: Em dê sube çend gundî, herine qapûya mûrov.” [wr. 25b]

Nivîsar: Çend manayên wê yên wekî: nivîs, nivîsîn, mektûbê hene (Kurdo: 577).

“Sûal: Te xwendîye û nivîsarê dizanî?

Cewab: Belê, min Qur’an xwendîye û nivîsarê nizamim.” [wr. 7b]

Şilî: Hirî ye. Jabayî not nivîsîye gotîye; hirîya berxan.

“Sûal: Şilîya we gelek e?

Cewab: Nêzûkî heftê menê heye.” [wr. 40b]

Mûn: Di ferhenga Kurdo yî da bi manayên wekî “zeîf, xerab” heye (r. 548). Li gor têbînîya Jabayî ya fransîzî di manaya xerab da ye (Il ya des bons et des mauvais débiteurs).

“Qerdarê qenc heye, ê mûn heye.” [wr. 14b]

Sol, Solbend: Sol ji bo nalên heywanan, solbend jî ji bo peyva “nalbend” bi kar anîye.

“Ez dê pereyêd solêd hespan bidim.” [wr. 37b]

“Solbend li van deran peyda dibe?” [wr. 4a]

Damar: Ji bo peyva “jinbav”ê bi kar anîye.

“Min bi xeyr ji damarekê kes tune.” [wr. 20a]

1.6. Navên Nexweşîyan

Yek ji tiştên giring ku em ji dîyalogan hîn dibin jî navên nexweşîyan û tiştên tîbî ne. Di dîyalogan da hem ji bo mirovan hem jî heywanan gelek nav derbas dibin. Eger em hinek nimûneyan bidin:

Ketewî (îltihab girtin, îltihab bûn. Di ferhenga Farqînî da wekî “kedewî”yê derbas dibe. r. 207)

“Eve hespa ketewî bûye, çi lê bikin?” [wr. 35b]

Kulek (Heywan yan jî mirovên ku seqet dibin û dikulin.)

“Beranekî kulek li vir heye, îmdî dê ser jê kin.” [wr. 12a]

Kulekî (Rewşa ku heywan, mirov seqet dibin û dikulin.)

“Bac heye û dizî û kulekî û qir heye.” [wr. 43a]

Qir (Nexweşîya veger ku gelek heywan pê dimirin.)

“Bac heye û dizî û kulekî û qir heye.” [wr. 43a]

Kepenek (Nexweşîya “ruam”ê ye. “Hîle” jî nexweşî ye.)

“Sûal: Îsale pezê semtê we paristî ye?

Cewab: Ne walleh, kepenek û hîle zaf e.” [wr. 20b]

Ho girtin (Elem girtin, îltihab girtin)

“Dibên kurê axê ho girtîye, dimire.” [wr. 31b]

Terk bûn (ji cih derketin)

“Ez fikûrîmê, ewî jî terk e, min êxiste cî.” [wr. 36a]

1.7. Navên Eşîretan û Miletan

Di dîyalogên Bazîdî da em rastî navên gelek eşîratan û miletan tên. Navên miletan yên wekî “rûs, ecem, terekeme, qazax, kurmanc, rom” gelek caran derbas dibin. Dîsa bi dehan navên eşîretan yên wekî “celalî, heyderî, redikî, birûkî, qereçorî, zîlan û hwd derbas dibin. Eger em hinek nimûneyan bidin:

Romî (Ji bo tirkên gotîye)

“Erê babo, leşkerê romîyan qe bi xeyr ji revê, bi kêrî çi tên!” [wr.18b]

Rûs

“Sefera rûsan û romê, ê berê çend e?”

“Sefera rûsan û romê, ê berê çend e?” [wr. 15b]

Terekeme (Ji bo turkmenan gotîye)

“Belê, terekeman lê daye.” [wr. 34b]

Qazax

“Jê vegere, paşê qazax rastî me dibin, xerab dibe.” [wr.18a]

Kurmanc

“Êk kurmanc e û êk file ye.” [wr. 34b]

Celalî

“Ez bi esil celalî me.” [wr. 19a]

Qereçorî(an)

“Gundî çûne karêwanê qereçoran, havêtine ser û deh ga birine.” [wr. 35a]

Zîlan, Heyderan

“Di nêva zîlan û heyderan bûye neyarî?” [wr. 9a]

Hesenî, Zirikî

“Dibên hesenan zirikan neyarî ye?” [wr. 23b]

Birûkî

“Keç birûkî ye.” [wr. 19a]

Cûnikî (Li gor nota Jabayî, ji Erîwanê ne)

“Ez dibêm ku cûnikan birine.” [wr. 25a]

Diryan

“Eşîra diryan e, ji boy qur’ê ‘asê bûne.” [wr. 38a]

1.8. Navên Welat, Bajar û Bajarokan

Dîyalogên Bazîdî ji hêla navên welat, bajar, bajarok, gund û navên cografîk jî têra xwe zengîn e. Bi taybetî navên herêma Serhedê tê da pir derbas bidin. Mûş, Kanîspî, Çildir, Axbul, Makû, Nerman, Erzirom hinek ji van navan in. Helbet navên welat û herêmên cuda yên wekî Erebiistan, Semol (Stenbol), Rewan, Trabzonê jî tê da derbas dibin. Eger em hinek mînakên bidin:

“Sûal: Tu ji ku yî?

Cewab: Ez **mûşî** me.” [wr. 1b]

Li **Gedûka Xanê**, li **Kanîspîyê** danîye. [wr. 5b]

Êla me dikeve **Axbulê**. [wr. 6a]

Ji vira heta **Makûyê** çend se’et in? [wr. 6b]

“Dibên ku xelkê **Çildirê** ne.” [wr. 34b]

“Li **Şorekelê** ye.” [wr. 16a]

“Şewatekî mezin **Semolê** bûye.” [wr. 15b]

“Dibên walîyê **Erziromê** ‘ezil bûye.” [wr.18b]

“Ji nêv êlê tîm, diçime **Rewanê**. [wr. 19a]

“Emîn Paşayê walîyê **Trabzonê** bûye walî.” [wr.18b]

“Li **‘Erebiistanê** pez çî dike? [wr. 43a]

“Dibêjin zîpîkekî ‘ecêbî li **Nermanê** barîye...” [wr. 24b]

“Li ser qeza **Oltîyê** ye.” [wr. 28b]

Siwarêd nizamî ne, dê biçine **Wanê**. [wr. 38a]

1.9. Navên Kesan

Di dîyalogan da yek ji tiştên ku bala mirovî dikêşe jî navên taybetî yên kesan in. Bi taybetî pîrbûna navên kurtkirî yên wekî “ Hiso, Ebdo, Miho, Silo, Elo” bala mirovî dikêşe. Xuya ye ji ber ku têkiliyên rûbirû û samîmî zêde ne, ev navana zêde ne. Wekî tê zanîn navlêkirina kesan bi çanda civakê, rabûn û rûniştina civakê gelekî têkildar e. Eger em hinek nimûneyan ji bo navên taybetî bidin:

“Mahîn û hespek li cem **‘Elîyê Hiso** heye.” [wr. 2b]

“Di dest **‘Elîxanê Makûyî** ye.” [wr. 6a]

“Bilanê **Haco** biçitin, ew zîrek e.” [wr. 16b]

“Li zoma **Keleşê ‘Ebdo** ne.” [wr. 40b]

“Li oba **Miho** beytarekî çê heye.” [wr. 35b]

“**Emîn Paşayê** walîyê Trabzonê bûye walî.” [wr.18b]

“Kurê **‘Elo** ye.” [wr. 21b]

“**Silo** silav kirin.” [wr. 21b]

“**Mela Qasim** bûye kirîv”. [wr. 21a]

1.10. Termên Eskerî

Di dîyalogan da gelek caran behsa şerê tirk, rûs, ecem, terekeme û hwd tê kirin. Dema ku tê behskirin jî gelek caran behsa rewşa wan ya leşkerî tê kirin. Loma gelek termên leşkerî di van dîyalogan da derbas dibin. Peyvên wekî “ordû, leşker, soldad, peyayê

nîzamî, nefer-‘am, casûs, qereqol, çete, armanc, tufeng” gelek caran hatine bikaranîn. Eger em ji metna Bazîdî nimûneyan bidin:

“**Ordûya** romê li kî derê ye?” [wr. 16a]

“Çiqas **leşker** û **top** heyn?” [wr. 16a]

“Panzdeh hezar **peyayê nîzamî** û êdî **siwarî** û **başibozix** e.” [wr. 16a]

“Ew jî deh hezar **soldad** û deh hezar qazaq û **nefer-‘am** in.” [wr. 16a]

“Divêtin ku em **casûsekî** ve rê kin, kanî çi xeber heye.” [wr. 16b]

“Dibên ku **qereqolê** wan rastî hevdû hatine, şerek kirine.” [wr. 16b]

“Çend siwar çûnê **teselê**?” [wr. 17b]

“Çar siwar çûne **sehê**.” [wr. 17b]

“Kuro çi dibêjî! **Çeta** wan neête me?”

“Ne, **leşkerê** giran e û **çete** naşînin.” [wr. 17b]

“Ne, **nîzama peyan** digel **topê** qenc e.” [wr. 18b]

“Eger min **armanc** hilanî tu terka **tufengê** bike.” [wr. 42b]

1.11. Navên Pîvanan

Di dîyalogên Bazîdî da yek ji tiştên ku bala mirovî dikêşe ew e ku navên gelek pîvanan tê da hene. Hinek ji bo me nas in lê hinek ji wan xerîb in. Peyvên wekî “somer, gez, semer, rital, hoqe, qod, part, men” gelek caran hatine bikaranîn. **Somer**: Du teneke û nîv e. (Farqînî:2114)

“Somera genim bi sedî û ceh bi çilî ye.” [wr. 38b]

Gez: Pîvana ku 70-75 cm ye. (Farqînî:832)

“Çox çend gez e?” [wr. 15a]

Semere: Semere sed aded e. (Farqînî:832)

“Şikir, me semerekî pez û çend dewar hene.” [wr. 19b]

Rital: Pîvana ku 8 kg e. (Îzolfî:533)

“Qenc e, ar rital bi pêncan e.” [wr. 26b]

Hoqe: Pîvana ku 1283 gram e. (Îzolfî:291)

“Goştê pezî hoqa bi şêst û goştê dewarî bi pêncî para ne.” [wr. 26b]

Qod: Pîvan ku 2 kg e. Di ferhenga Îzolfî da wekî “kod” derbas dibe (r. 343).

“Biha erzan, here qodekê bikir û bide hespan.” [wr. 8a]

Part: Çend manayên partê hene, wekî 30 aded; koma gîya; qeflek gîya. (Farqînî:1659)

“Sûal: Part çiqasî didetin?”

Cewab: Part heft û heşt kod didetin.” [wr. 29b]

Men: Pîvana ku 3 kg e. (Farqînî:1464)

“Sûal: Menê bi çendê hildixînin?” [wr. 40b]

1.12. Navên Meslek û Karan

Di dîyalogan da navên gelek meslek û karan derbas dibin. Dema em bala xwe didin navên wan meslekan em dibînin ku ew nav rengvedana jîyana rojane û sosyal ya demê ne. Solbend, zêrker, lêbûd, delal, çerçî, beytar, çûdar û muxtar hinek ji wan navên meslekan in. Hinek ji wan meslek û karan îro jî hene lê hinek ji wan yan nemane yan jî kêmane. Eger em hinek mînakên bidin:

Solbend: Solbend ji bo peyva “nalbend”ê bi kar anîye.

“Solbend li van deran peyda dibe?” [wr. 4a]

Çerçî: Ji bo “etar” bi kar anîye.

“Çerçî hatîye, êmiş îneye, bikin.” [wr. 43b]

Lebûd: Ji bo “helac”ê bi kar anîye.

“Dibên lebûd hatine nava êlê?” [wr. 40b]

Çûdar, celebî: Tacîrê heywanên ku ji bo goşt û qesabîyê ne.

“Ez çûdar im û celebîyê dikim.” [wr. 42b]

Çapar: Kesê ku tiştan dibe û tîne, postevan.

“Min seh kir, çaparê ‘eceman e.” [wr.18b]

Bostancî

“Ez dibêm ku bostancî guh nedayê.” [wr. 26a]

Beytar

“Tu li ku hurî beytarîyê bûyî?” [wr. 36a]

Kemandar: Kesê ku tîr û kevanê bi kar tîne.

“Ez û tu em dê siwarî û kemandarîya xwe biceribînin.” [wr. 42a]

Zêrker

“Go zêrker hatîye oba ‘Emo?” [wr. 40b]

Delal: Kesê ku bang dike û ji xelkî ra daxuyanîyan radigihîne.

“Dibêjin ku delal gazî kirîye, pera şikestin.” [wr. 26b]

2. BERHEMA “TUHFETU’L-XÎLÂN FÎ ZIMANÊ KURDAN”

Berhema Mela Mehmûdê Bazîdî ya giranbiha, “Rîsaleyî Tûhfetu’l- Xîlân Fî Zimanê Kurdan” (Dîyarîya Dostan di Zimanê Kurdan da), ku ji bo hînkirina kurdîya kurmançî hatîye amadekirin û ji beşên rêziman, ferhengok û dîyalogan pêk tê, yek ji giringtirîn berheman e ku di koleksiyona Aleksandre Jabayî da cih girtiye. Herçend yekemîn rêzimana kurmançî, ya Elî Teremaxîyî (1590) ye lê wisa xuya dike ku cara pêşî xebata ku tenê ji bo rêzimana kurmançî û bi zimanê kurmançî hatîye kirin, ev xebata hêja ya Bazîdî ye.

Di vê xebatê da Bazîdî da sê beş hene ku ev beş; rêziman, ferhengok û dîyalog in. Bazîdî, di vê xebatê da û bi taybetî di beşa rêzimanê da, li ser bi dehan mijarên rêziman û zimannasîyê sekinîye û bi mînak ew, rave kirine. Ev xebat ji alîyê naveroka xwe ve gelekî dewlemend e. Ji mijarên morfolojîk û morfo-sentaktîk bigirin heta yên sentaktîk û semantîk, gelek mijarên zimanî tê da cih girtine. Ji mijarên beşên axaftinê, têperîyê (transitivity) bigirin heta hokarîkirinê (causativisation) û teneperkirinê (detransitivization); ji kêşana karan bigirin heta deman û rêkkeftina (agreement) li gel cihnavan; ji hevalnavên pêveberî, biçûkkirina navan bigirin heta lîsteya kar û navên hevmana û hevdeng û dariştina bêjeyan, gelek mijar tê da hene.

Dema em ji hêla naverokê ve li vê xebata Bazîdî binêrin, bi hêsanî tê dîtin ku sê beşên ji hev cuda ne. Bazîdî ji ber ku ev pirtûk bi mebesta hînkirina kurdîya kurmançî nivîsîye, beşa yekem bi giranî kirîye rêziman; beşa duyem ferheng û beşa sêyem jî kirîye dîyalog. Eger em li naveroka beşan jî binêrin em dibînin ku bi taybetî di beşa rêzimanê da gelek binbeş û mijar hene. Bazîdî nav li van mijar û binbeşan nekirine lê em ji naveroka wê, dikarin gelek mijar û binbeşan jê peyda bikin. Eger em vegerin ser vê xebatê û mijarên ku Bazîdî li ser wan sekinîye, binirxînin û dabeş bikin, em dikarin beş û mijaran weha bidin:

2.1. Rêziman

Beşa herî berfireh ya xebata Bazîdî, ev beş e ku ji 74 rûpelan pêk tê û bi dehan mijarên rêzimanî û zimanî tê da hene. Wekî me got Bazîdî ev mijarên rêzimanî li gor tîpolojîya erebîyê, li ser sê beşan; kar, nav û herfan dabeş kirine. Di vê beşê da gelek termên rêzimanê û bi giştî zimannasîyê bi kar anîne. Berî ku em dest bi analîzan bikin eger em lîsteya termên ku Bazîdî bi kar anîne, bidin; hem mijar hem jî dewlemendîya naveroka xebata Bazîdî dê hêsantir bê famkirin. Termên ku Bazîdî bi kar anîne û li hember wan jî bergindên ku îro tên bikaranîn, ev in:

bina fa'il	: aktîf (active)
bina mechu'l	: pasîf (passive)
camid	: necandar (animate)
cem'	: pirhejmar (plural)
emr	: ferman (imperative)
esmayêd naqise	: navên kurtkirî
esmayêd tame	: navên temam (nekurtkirî)
esmayu'l-işarê	: navên nîşanê
fi'l	: kar (verb)
hazir	: amade, guhdar (hearer)
hezif	: jêçûn (deletion)
hezifkirin	: jêbirin (deletion)
ism	: nav (noun)
ismê fa'il	: bikernav
ismê mef'ûl	: berkarnav
istîfham	: pirsîyarî (interrogation)
istîqbal	: dahatî (future)
lazim	: têneper (intransitive)
lefs	: peyv, bêje (word, lexeme)
masdar	: rader (infinitive)
mazî/borî	: borî (past)
mef'ûl	: berkar (object)
mexsûs/'elem	: taybetî (proper)
mirekeb	: lêkdayî (compound)
mitkelim	: axêver (speaker)
mitkelimê me'e'l-xeyr	: axêverê pirhejmar (em/me)
mûzarî	: dema niha/fireh
micered	: razber (abstract)
mifred	: yekhejmar (singular)
mi'enes	: mê (feminine)
mişterek	: hevbeş / cins
mite'adî	: têper (transitive)
mizeker	: nêr (masculine)
muzaf	: raveber, modîfîyekirî (modified)
muzafun îleyhî	: raveker, modîfîyeker (modifier)
nefi	: nerênî (negative)
nehî	: qedexe

nîd'a	: bangkirin (interjection)
nisbet	: xwedîtî (possession)
qalîn	: stûr
tesxîr	: biçûkkirin (diminutive)
tesnîye	: duhejmar
tenkîd	: teqezkirin
texfîf	: sivikkirin
xayib	: neamade (ew/wî/wê/wan)
zîrûh	: candar (animate)
zamîr	: cihnav (pronoun)

2.2. Beşa Ferhengokê

Bazîdî piştî ku mijarên rêzimanî ku li ser kar, nav û herfan in, rave dike, dest bi mijarên têkildarî ferhengê dike. Ji ber ku Bazîdî ev pirtûk, bi mebesta hînkirina zimanî amade kirîye, beşek jî kirîye ferhengok ku duzimanî ye û kurdî-tirkî ye. Bêguman ev ferhengoka wî hem ji hêla ferhengnasîya kurdî ve hem jî hêla dîrokî ve gelekî giring e. Lewra hem gelek peyv tê da hene ku dê têkevin ferhenga kurdî hem jî yek ji kevintirîn ferhengên kurdî ye û bihayê wê yê dîrokî zêde ye.

Peyvên wekî “**konelk**”ê (ji bo şemsîye/sîwanê) em tê da dibînin ku di ferhengên kurdî yên berdest da nînin. Xulase, ev ferhengoka balkêş ya kurdî-tirkîyê, ne tenê ji hêla dîrokî û kevnbûna xwe ve, ji gelek alîyên din da jî giranbiha ye. Di vê ferhengokê da, li ser kar û nava disekine û lîsteyeka dirêj ya kar û navên hevmana (synonym) dide. Herweha lîsteya navên hevdeng (homonym) jî beşek ji vê ferhengokê ye. Yanî, bi giştî ev ferhengoka ku ji 50 rûpelî (77b heta 127b) pêk tê ji lîsteyên kar û navên hevmana û navên hevdeng pêk tê. Em ji beşa karan dikarin dest bi nirxandina wê bikin:

2.2.1. Karên hevmana:

Bazîdî xwestîye lîsteyeka dirêj ya karên hevmana bide. Lê dema ku em li lîsteya wî dinêrin em dibînin ku hevmana û varyantên karan tev li hev kirine. Wekî tê zanîn, peyvên hevmana ew peyv in ku etîmonên (etymon) anku rehên wan ji hev cuda ne lê manaya wan yek e. Peyvên varyant jî ew peyv in ku rehên wan yek in lê li gor herêm û devokan, guhertin di wan da çê bûne. Wekî mînak reha peyvên “nêrîn, nerîn, nêrtin, nihartin, niherîn, nihêrtin...” yek e, lê li gor herêm û devokan ji hev cuda bûne. Lê peyvên mîna “dîfin, kepû, poz, bêvil”ê hevmana ne û rehên wan ji hev cuda ne. Eger em vegerin ser ferhengoka Bazîdî û li lîsteya wî ya karên hevmana binêrin û em dê bibînin ku hinek tişt tev li hev kirine anku

şaşî kirine. Em dikarin van şaşî û tevlihevîyên di lîsteya karên hevmana da, bikin sê beş:

2.2.1.1. Peyvên ku varyant in, lê ne hevmana ne:

Bazîdî, karên hevmana û varyantên wan tev li hev kirine ku du tiştên cuda ne. Wekî mînak karên “borandin” û “buhartin”; “ajotin” û “hajotin”; “dirîn” û “diryan”ê varyant in, ne ku hevmana ne. Lê Bazîdî varyant û hevmanayên karan tev li hev kirine û ew di nava hev da dane.

2.2.1.2. Peyvên ku ne kar in lê di nava karan da hatine nîşandan:

Di lîsteya Bazîdî ya karên hevmana da, gelek peyvên wekî nav, hevalnav û hevalkaran jî cih girtine û şaşîya herî mezin ya vê lîsteyê di vî warî da ye. Wekî mînak peyvên wekî “rastî”, “duristî”, “îzan”, “zîhn”,

“maldarî” hwd nav in, lê ne kar in. Peyvên wekî “beredayî”, “jêhatî”, “şemirî” hwd hevalnav in û yên wekî “di gel”ê jî daçek in.

2.2.1.3. Peyvên ku ne hevmana ne û ne jî varyant in:

Hinek peyv jî di lîsteya karên hevmana da hene ku ne hevmana ne û ne jî varyant in lê ji hêla têperiyê ve cuda ne. Lewra karên ku Bazîdî wekî hevmana dane, hinek jê têper hinek jî têneper in. Wekî mînak karên “patin” û “pejyan”, “cisandin” û “cisîn”ê ji aliyê têperiyê ve cuda ne ku “patin” û “cisandin” karên têper in û “pejyan” û “cisîn” jî têneper in û manayên wan cuda ne.

2.3. Karên hevdeng:

Bazîdî, xwestîye lîsteya karên hevdeng bide lê çawa ku di lîsteya karên hevmana da gelek problem hebûn, di vê beşê da jî tevlihevî û şaşî hene. Em van tevlihevî û şaşîyan dikarin weha dabeş bikin:

2.3.1. Peyvên ku nav in, lê ne kar in:

Di nava lîsteya Bazîdî ya karên hevdeng da gelek nav hene û tu têkilîya wan û karan bi hev ra nîne. Ya rast di vê beşa karên hevdeng ya ferhegokê da, ji karên hevdeng bêhtir navên hevdeng hene. Wekî mînak peyvên mîna “belekî”, “nav”, “tîvir”, “jan” û “çûk” navên hevdeng in û herçend wekî hev tên bilêvkirin, Bazîdî manayên wan yên cuda jî dane.

2.3.2. Peyvên ku hevalnav in, lê ne kar in:

Beşek ji lîsteya Bazîdî ya karên hevdeng jî, hevalnav in. Wekî mînak peyvên mîna “zirav”, “rijî”, “xebîs”, “kêm” û “şil”ê hevalnav in û ne kar in.

2.4. Navên hevmana:

Di ferhengoka Bazîdî da, beşa herî zêde û dirêj (96b-127b), ev beş e ku lîsteya navên hevmana ye. Di vê lîsteyê da jî hinek tevlihevî û şaşî hene. Lê li gor lîsteyên karan, bêhtir bi rêk û pêk e û şaşî, ne bi qasî yên karan in. Eger em li gor sernavan van şaşîyan dabeş bikin dê weha bin:

2.4.1. Navên ku varyant in, lê ne hevmana ne:

Di lîsteya navên hevmana da, tiştê herî zêde bala mirovî dikişîne ew e ku Bazîdî gelek caran varyant û hevmanayên navan tev li hev kirine. Wekî mînak “meriv” û “mirov”; “hesp” û “esb”; “ziman” û “ezman”; “newal” û “nihal”; “kanî” û “kehnî” varyant in lê ne hevmana ne. Ji nava varyantan hinek varyant hene ku formên cihguherînê (metathesis) ne. Wekî mînak peyvên “cînar” û “cîran”, “herwaz” û “hevraz”ê, mînakên cihguherînê ne.

2.4.2. Navên ku pirmana (polysemous) ne, lê ne hevmana ne:

Di lîsteya navên hevmana da, herçend ne zêde ne jî, hinek peyvên wekî “hîv” û “roj”ê hene ku peyvên pirmana ne, lê ne hevmana ne.

2.5. Dîyalog

Beşa sêyem û ku Bazîdî ew wekî pêveka (zeyl) xebata xwe bi nav kirîye, dîyalog in. Bazîdî dîyar dike ku ev beş, dê alîkarîya axaftina zimanî bike û bi vî awayî dê axaftin

hêsantir bibe (wr. 127b). Ev beşa ku ji 17 rûpelan (wr. 127b -144b) pêk tê, di forma pirs û bersivan da ye û di nava sê beşên pirtûkê da, herçend beşa herî kurt e û 17 rûpel e, lê ji bo famkirin û analîza wê heyamê gelekî giring e. Li ser mijarên wekî têkilîyên niştecih û revendan, têkilîyên kurdan û Îranê, têkilî û nakokîyên dînî yên elewî û sunîyan, teknîk û stratejîyên şerkirinê, têkilîyên eşîrî, agahîyên li ser erdnîgarîyê, rêxistinbûna civakî û siyasî ya kurdan, têkilîyên iqtîdarî yên nava kurdan û nava cîranên kurdan û hwd gelek agahîyên giring dikarin ji wan diyalogan bînin famkirin.

3. BERHEMA “KÊŞANA KARÊN KURDÎ”

Mela Mehmûdê Bazîdî berhema xwe ya “Kêşana Karên Kurdî” di sala 1866ê da ji bo hînkirina kêşana karên kurdîya kurmançî nivîsîye. Navê berhemê, ne ji alîyê Bazîdî ve lê ji alîyê A. Jabayî ve û bi frensîzî wekî “Conjugaison des Verbes Kurdes” hatîye danîn ku kurdîya wê dibe “Kêşana Karên Kurdî”. Ev berhema Bazîdî jî wekî berhemên din gelekî giring e ku di koleksiyona Aleksandre Jabayî da cih girtiye. Di vê berhema tematîk da ji bilî morfolojîya karên kurdî, li ser sentaksa kurdî jî agahîyan giring hene.

Ev berhema Bazîdî, bi giranî li ser morfolojîya kêşana karan e û zêdetirî bîst karên kurdî wekî mînak pêşkêş kirine. Wî kar li gor cihnavkên kesane û li gor demên borî, niha û dahatîyê û nerênîya van deman û dîsa li gor raweyên fermanî, aktîf û pasîf û hwd kêşane. Lê herçend piraniyê berhemê ji kêşana karan pêk tê jî, beşek biçûk ji vê xebatê li ser sentaksa kurmançîyê ye û behsa hêmanên hevokê û hevokên cûrbicûr dike. Bazîdî bi xwe jî di vê xebatê da diyar kirîye ku berhema wî ji nehiw (sentaks) û serfê (morfolojî) pêk tê û wiha dibêje: *“Me’lûmê te bitin ku ev qewa’idêd ku di vê rîsalê da hatîye zikir û beyan kirin, ji usûlê qewa’idêd ‘ilûmêd nehwa û serfê ne.”* [wr. 23b].

Ev berhema Bazîdî zêde nayê zanîn û heta niha nehatîye çapkirin. Aydın (2019) li ser vê berhemê gotarek nivîsîye ku gotara wî bêtir danasîna berhemê ya ji alîyê fizîkî, nasnameyî û naverokî ye û li ser naveroka wê analîz cih nagirin.

Bazîdî di çerçoveya morfolojîya kurmançîyê da, ne tenê li ser karan û kêşana wan, lê li ser beşên axiftinê (parts of speech) yên din jî sekinîye. Wî di bin tesîra tîpolojîya rêzimana erebîyê da, beşên axiftinê wekî sê beş dîtine ku “kar”, “nav” û “herf” in. Mijarên wekî yekhejmarî, duhejmarî û pirhejmarîya navan, nîsbet, îzafe, bikaranîna daçekan û hwd bi vê mantixa dabeşkirina erebîyê, tê da cih girtine. Em dê di vê xebatê pêşî li ser taybetîyên zimanê Bazîdî û piştra jî li ser naveroka berhemê nixandinan bikin.

3.1. Zimanê Bazîdî

Bazîdî ji ber ku li gor tîpolojîya zimanê erebî ev berhem nivîsîye hemû tîgehên rêzimanî jî bi erebî ne. Eger em lîsteya termên ku Bazîdî bi kar anîne, bidin; hem mijar hem jî dewlemendîya naveroka xebata Bazîdî dê hêsantir bê famkirin. Termên ku Bazîdî bi kar anîne û li hemer wan jî bergindên ku îro tên bikaranîn, ev in:

alet	: navgîn, amûr
cem’i	: pirhejmar
emr	: ferman
emrê hazirî	: raweya fermanî
esmayu’l-işarê	: navên nîşanê
fa’ilê salis	: bikera sêyem
fa’ilê sanî	: bikera duyem
fa’ilê ewel	: bikera yekem

fi'l	: kar
fi'lê hal	: dema niha
fi'lê istîqbal	: dema dahatî
fi'lê mazî yê meçûl	: dema borî û raweya pasîf
fi'lê mazî yê me'lûm	: dema borî û raweya aktîf
hazir	: amade
herf	: herf
hezif	: jêçûn
ism	: nav
ismê alet ê cem'i	: navê navgînê yê pirhejmar
ismê alet ê mifred	: navê navgînê yê yekhejmar
ismê cins ê mifred	: navê cins yê yekhejmar
ismê cins ê tesnîye weyaxo cem'i	: navê cins yê pirhejmar
ismê fa'il	: bikernav
ismê mef'ûl	: berkarnav
ismê mekan	: navê cihî
ismê zeman	: navê demê
istîqbal	: dahatî
lazim	: teneper
leفز	: peyv
mazî	: borî
mesder	: rader
me'ûl	: berkar
me'ûlê sanî	: berkara duyem
me'ûlê salis	: berkara sêyem
me'ûlê ewel	: berkara yekem
mekan	: cih
mitekellim	: axiver
mite'adî	: têper (wekî nav)
mite'eddîd	: têper (wekî hevalnav)
muzafê îleyhê cem'i	: ravekera pirhejmar
muzafê îleyhê mifred	: ravekera yekhejmar
muzafun îleyhî	: raveker, modîfîyeker
mifred	: yekhejmar
nefi	: nerênî
nefyê hal	: nerênîya dema niha
nefyê istîqbal	: nerênîya dema dahatî
nehyê hazirî	: nerênîya raweya fermanî
nisbet	: xwedîtî
tesnîye	: duhejmar
xayib	: neamade
zemîn	: cihnav
zîrûh	: candar

3.2. Naveroka Rêzimanê

Di zimannasîyê da morfolojîya karan bi du awayan tèn analîzkirin ku yek morfolojîya dariştinê (derivational) ya din jî morfolojîya rêzimanî ye. Bazîdî di vê berhema xwe da li ser morfolojîya rêzimanî ya karan sekinîye lê li ser morfolojîya dariştina karan nese kinîye. Di morfolojîya rêzimanî da mijarên wekî dem (tense), xuyang (aspect), rawe (mood), rêkeftina li gel cihnavan (pronominal agreement) ya karan hene.

Bazîdî di vê berhema xwe da li ser kêşana bîst û sê karan sekinîye û li gor dem, rawe, rêkeftina cihnavan û hwd ew kêşane. Karên ku wekî mînak dane ev in: *Nîşan dan, zayîn, ajotin, bi pê ketin, qelisîn, kirin, birin, spartin, patin, nasîn, ketin, bihistin, şandin, ve rê kirin, girîn, danîn, çêkirin, dîtîn, xwarin, gihiştin, kutan, dirûn, lez kirin*. Herwiha ji ber ku li gor tîpolojîya erebîyê analîz kirine, ji bo her karekê li gor formên wekî bikernav (ismê fa'il), berkarnav (ismê mef'ûl) û navê cihî (ismê mekan) jî bergind nivîsîne.

3.3. Naveroka Ristesazî

Bazîdî dema behsa mijara têperî û teneperîya karan dike gelek hevokan wekî mînak dide û yek bi yek rave dike kîjan biker e, kîjan berkar e û kîjan kar e. Dema behsa biker, berkar û karan dike, li ser rolên wan yên semantîk jî disekine. Wekî mînak ji bo hevoka “Elo, Hiso kuta” dibêje:

(‘Elo) fa’il (e), lewra ew “kutan” fi’la wî ye.

(Hiso) mef’ûl e, lewra ew “kutan” li ser wî waqî’ bûye.

(Kuta) fi’l e, lewra fi’la ku peyda bû “kutan” e. (wr. 17b)

Piştî ku hevokên wekî “Miho xîvet pêça.” (wr. 17b), “ ‘Ebdos hesp berdan.” (wr. 18a), “Ez ketim” (wr. 19a) û hwd bi heman awayî analîz dike, Li ser hejmara biker û berkarên jî disekine. Li ser vê mijarê bi kurtî behsa ewan xalan dike:

-Dibe ku di hevokekê da du yan zêdetir berkar hebin. Bazîdî wekî mînak hevoka “Miho pere bi deyn dane Elo, Şemo, Hiso.” dide û ewana dîyar dike:

(Miho) fa’il e, lewranê ewe “bi deyndayîn” jê peyda bû.

(Bi deyn daye) fi’l e, “deyn dayîn”.

(‘Elo) mef’ûlê ewel. (berkara yekem)

(Şemo) mef’ûlê sanî. (berkara duyem)

(Hiso) mef’ûlê salis. (wr. 19b) (berkara sêyem)

- Dibe ku di hevokekê da du yan zêdetir biker hebin. Bazîdî wekî mînak hevoka “Ez û tu, ew, peran bidin ‘Emo.” dide û ewana dîyar dike:

(Ez) fa’ilê ewel. (bikera yekem)

(Tu) fa’ilê sanî. (bikera duyem)

(Ew) fa’ilê salis. (bikera sêyem)

(Bidin) fi’l e.

(‘Emo) mef’ûl e. (wr. 20a)

- Dibe ku di hevokekê da du yan zêdetir biker û du yan zêdetir berkar hebin. Bazîdî wekî mînak hevoka “Em, hûn, ewan, bibin biçin malêd Keleş, Hiso, Şemo.” dide û ewana dîyar dike:

(Em) fa’ilê ewel. (bikera yekem)

(Hûn) fa’ilê sanî. (bikera duyem)

(Ewan) fa’ilê salis. (bikera sêyem)

(Bibin) fi’ilê ewel. (kara yekem)

(Biçin) fa’ilê sanî. (kara duyem)

(Keleş) mef'ûlê ewel. (berkara yekem)	
(Hiso) sanî.	(berkara duyem)
(Şemo) salis.	(berkara sêyem)

ENCAM:

Her sê berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî, “Xeberdana Zimanê Kurmancî ye”, “Tuhfetul Xîlan fî Zimanê Kurdan” û “Kêşana Karên Kurdî” bi naveroka xwe ya zengîn û giringîya tarîxî ji bo tarîxa xebatên kurdî, berhemên gelekî giring in. Hem ji alîyê ferhenga xwe û gencîneya peyvan ve hem jî ji bo famkirina rewşa kurdan ya çand û sosyo-polîtîk a wê demê, xwedî cihên taybetî ne.

Ev sê berhem jî hêla rêzimana kurdî hem jî ferhengnasîya kurdî çavkanîyên dîrokî ne. Bi taybetî berhema wî ya Tuhfetul Xîlan fî Zimanê Kurdan bi naveroka xwe ya rêzimanî gelekî balê dikêşe ku belkî yekem pirtûka rêzimana kurmancîyê ye ku bi kitekit bi dehan mijarên rêzimanî ewqas tê da cih digirin. Berhema wî ya “Kêşana Karên Kurdî” jî xebateka tematîk e ku bi taybetî li ser mijareka spesîfîk e.

Di berhema wî ya “Xeberdana Zimanê Kurmancî ye” da jî em rastî ferhengeka gelekî xurt tên. Ji peyvên kêmnas bigirin heta îdyom û qalibên zimanî, ji navên kesan, eşîran, bajar û bajarokan bigirin heta navê pîvanan, ji navê meslek û karan heta navên nexweşîyan û termên termên leşkerî bi dehan mijar tê da peyda dibin. Ev mijar hemû bi zimanekî gelekî herikbar, di forma dîyalogan da pêşkêş kirine. Peydabûna xebatên bi vî rengî ji bo tarîxa xebatên zimanê kurdî û sermîyanê kurdan yê neteweyî gelekî giring e.

ÇAVKANÎ:

- Aydın, T. (2019). Qewa'idêd Serfa Kurdî (I,II), Mela Mehmûdê Bazîdî, Nûbihar Akademî, 12(6), 59-98.
- Bedir Khan, K. A. & Bertolino, J. & Nezan, K. (2017). Dictionnaire Kurde Français, Ferhenga Kurdî-Fransîzî, Istanbul: Avesta.
- Bilbil, M. & Öztürk, M. (2019). Rêzimana Mela Mehmûdê Bazîdî, Tuhfetul Xîlan fî Zimanê Kurdan, Nîrxandin-Metin-Faksîmîle, Stenbol: Weqfa Mezopotamyayê.
- Bülbül, M. & Öztürk, M. (2020). Berhema Mela Mehmûdê Bazîdî, Kêşana Karên Kurdî, Nîrxandin-Metina Sadekîrî, Latînîzekirî-Faksîmîle, Stenbol: Weqfa Mezopotamyayê.
- Bülbül, M. & Öztürk, M. (2022). Berhema Mela Mehmûdê Bazîdî, Xeberdana Zimanê Kurmancî ye, Metin-Analîz-Faksîmîle, Stenbol: Weqfa Mezopotamyayê.
- Demirhan, U. (2007). Ferhenga Destî, Kurdî bi Kurdî. Çapa 2. Stenbol: Sewad.
- Farqînî, Z. (2022). Ferhenga Mezin a Kurdî-Tirkî, Büyük Kürtçe-Türkçe Sözlük. Stenbol: Enstituya Kurdî ya Stenbolê.
- Îzolî, D. (2022). Ferheng Kurdî-Tirkî/Türkçe-Kürtçe. Enqere: Özgürlük Yolu Vakfı Yayınları.
- Kurdo, Qanatê (1960). Ferhenga Kurdî-Rûsî. Moskova: Neşîrxana Dewletê ya Ferhengêd Zimanê Dereve o yê Sovêtîstanê.
- Mela Mehmûdê Bazîdî (1865). “Xeberdana Zimanê Kurmancî ye”, Nusxeya Dijîtal a Arşîva Aleksandre Jabayî ya li Pirtûkxaneyê Akademîya Zanistan ya Rûsyayê, No: Kurd 50.
- Öztürk, M. (2017a). Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî (Vekolîn û Saloxdan), Ankara: Lîs.
- Öztürk, M. (2017b). Mela Mehmûdê Bazîdî'nin Kürtçe-Türkçe Sözlüğü (İnceleme-Metin). Doğu Araştırmaları, 17(1), 57-89.

Çavkanîyên Dîjîtal

<https://www.nisanyansozluk.com>

<https://turklehceleri.org/tr>

<https://sozluk.gov.tr/>

Abstract::

Mela Mahmud Bazidi (1797-1867) wrote many works for teaching Kurmanji in the 1860s. Bazidi was the Kurdish teacher of Aleksandre Jabayi (1801-1894), who was the Russian ambassador and stayed in Erzirom for 15 years. Jabayi collected and recorded many works that are very important and historical for the field of Kurdish studies. Dozens of valuable works on history, literature, folklore, language, translation are included in the Aleksandre Jabayi Signature Collection. There are also three very valuable works on the Kurdish language and grammar that Mela Mahmud Bazidi wrote to teach Kurdish to Aleksandre Jabayi. These works are "Tuhfetul Xîlan fi Zîmanê Kurdî", "Keşana Karen Kurdî" (1866) and "Kermançî Ye Keberdana" (1865). The first two works are about Kurmanji Kurdish grammar and the last one consists of dialogues and Bazidi wanted to teach the language through dialogues.

In this review, we will evaluate these three works from the linguistic point of view. Bazidi has analyzed Kurdish according to Arabic typology in his grammatical works and therefore many grammatical terms are in Arabic. In particular, his work "Tuhfetul Xîlan fi Laine Kurds" is a very detailed grammar and contains dozens of grammar topics. His other grammatical work is also thematic and is based on Kurdish works. A part of his work is a dictionary which is apparently the first Kurdish-Turkish dictionary. But his work, which was not known until now, "Kurmanci Language Communication" is different from the others in terms of linguistic features. Throughout his writing, Bazidi used everyday language or the language of the people. There are many different topics and the vocabulary is very rich. From conflicts between states, tribes and families to beliefs between people, from commercial affairs to diseases and their treatment, dozens of topics have been presented in everyday language but with a rich vocabulary.

Keywords: *Mela Mahmoud Bazidi, Language, Grammar, Terminology, Dictionary.*